# KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan
a Bajarê Bremenê

KiTa Hêlîna Zarokên Biçûk
KiTa Baxçeyê Zarokan
KiTa Fêrgeha Zarokan
KiTa Hevdîtin
KiTa Malbat

[Übersetzt in die Sprache Kurdisch]

# Rêziknameya Bikaranînê:

**Rêbazên ji bo lênêrîna zarokan a danê rojê ya li navendên zarok û malbatan ên KiTa Bremenê**

ji Çile 2023

## Agahiyên girîng ên ji bo destpêkê

**KuFZ çi ne?**

KuFZ navê kurtkirî yê Navendên Zarok û Malbatan ên KiTa Bremenê ye. KuFZ ciyên ji bo zarokan û malbatên wan in. KUFZ zarokan perwerde dikin, digihînin û li wan dinêrin.

**Ji bo xebata KuFZê çi girîng e?**

- KuFZ bi awayê ku ji zarokê/î re herî baş e, piştgirî dide her zarokî/ê.
- KuFZ bi dêûbavan re dixebite. Tevahiya lênerên qanûnî yên zarokan wekî dêûbav tên pênasekirin. Ango Dayik an jî bavê tenê yê hay ji zarok dimîne, dêûbavên lênêr an jî mirovên wan ên ku li gel wan dijîn.
- KuFZ bi mirovên li taxê re dixebite.

Ji bo malbatan KuFZ muxatabên rast in. *Hûn dikarin agahiyên bêhtir di borşura „Konsepsiyona Çarçoweyê ya ji bo pêşketina navendên zarok û malbatan".*

**Rêziknameya bikaranînê ji bo kê li kar e?**

Rêziknameya bikaranînê di derbarê maf û peywirên dêûbav, zarok û mêvanan de agahî dide.

## Pêwendiya Lênêrîna Zarokan

**Hûn çawa dikarin ji bo zarokê/a xwe ciyê lênêrînê bibînin?**

Divê hûn ji bo lênêrîna zarokan serlêdanê bikin. Di vê mijarê de KuFZ li gorî Qanûna Ciyê Qebûlkirinê tevdigerin.

Gava KuFZek bikaribe zarokê/a we qebûl bike, hûn ê bersiva erêkirina wergirin.

**Divê hûn di 14 rojan de vê erêkirinê bi awayê nivîskî piştrast bikin.** Heger hûn piştrast nekin, hingê zarokekî/e din dê bikeve şûna wî/wê.

Adresa Postê
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen
Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de
Tram
Xetên 3,5
Rawestgeh
Eduard-Schopf-Allee
KiTa Bremen
Şîrketa xweser
a Şaredariya Bajarê
Bremenê
Rêvebirê Saziyê
Wolfgang Bahlmann
Cîgirê Rêvebriya Saziyê
Petra Zschüntzsch
Deutsche Bundesbank
Beşa Hannoverê
IBAN
DE27 2905 0000
1070 6000 00
BIC
BRLADE22XXX
Hejmara xercê
60/146/12457

**Ji kengê hete kengê zarokê/a we dikare ji xizmeta lênêrînê sûdê bigire?**
Zarok her car ji bo saleke baxçeyê zarokan tên qebûlkirin. Sala baxçeyê zarokan di 1ê Tebaxê dest pê dike û di 31ê Tîrmehê diqede. Gava zarokek bi derngî were qebûlkirin, dîsa jî sala baxçeyê zarokan di 31ê Tîrmehê de diqede.
Ciyê lênêrînê ji bo xizmeteke taybet, mînak ji bo hêlîna biçûkan, baxçeyê zarokan an jî lênêrîna piştî dibistanê. Zarokê/a we vê xizmetê ji bo serê rojê hejmareke diyar a saetan werdigire.
**Hûn çawa dikarin lênêrîna zarokan ji bo sala baxçeyê zarokan a pêş dirêj bikin?**
Divê hûn **her sal serlêdanake nû** ji bo sala baxçeyê zarokan a pêş bikin. Û divê hûn dîsa erêkirinê di nav 14 rojan de bi awayê nivîskî piştrast bikin.
Gava ji bo saleke din jî mafê we yê lênêrînê hebe, hingê zarokê/a di heman KuFZê de li ciyê xwe dimîne. Ev yek ji bo zarokên li hêlîna biçûkan û baxçeyê zarokan derbas dibe.
**Di dema lênêrîna zarokê/a we de peywira hayjêmanê ya kê ye?**
Dêûbav ji bo dema lênêrîna zarokan a li KuFZê û di dema gera li derve de peywira hayjêmanê didin xebatkaran. Peywira hayjêmanê di *Qanûnnameya Sîvîl de qanûna § 1631 bend 1 de* hatiye nivîsîn.
Di dema lênêrîna zarokê/a we de ev rêbazên di vê Rêziknameya Bikaranînê de û rêbazên din ên KiTa Bremenê li kar in.

## Demên Vekirî, Betlane û Xizmetên Awarte

**Di kîjan saetan de zarokê/a we dikare ji lênêrînê sûdê bigire?**
KuFZ ji Duşemê hete Înê ji saet 8an hete saet 16an vekirî ye. Fêrgeha zarokan ji duşemê hete înê ji saet 13an hete saet 16an vekirî ne. Wekî din di pêşî de bi Meclîsa Şêwirmend ya Dêûbavan re di derbarê vê yekê de biaxivin.
Her KuFZek bi serê xwe biryar dide, ka ew xizmeta zû an jî ya dereng didin. KuFZ ji tevahiya dêûbavan pirsa daxwazên wan dike. Paşê KuFZ li gorî derfetan dinirxîne û biryarê dide, ka kîjan xizmetan ew didin. Xizmetên wan her wisa li gorî hejmara xebatkarên li KuFZa wan diguhere.
**Zarokê/a we dikare di dema betlaneya dibistanan de were KuFZê?**
Di betlaneya dibistanan xizmete sînorkirî ya betlaneyê tê dayîn. Ev xizmeta di dema betlaneyê de dikare ji xizmeta normal cudatir be. Gava zarokê/a we ji xizmeta betlaneyê sûdê bigire, hingê divê hûn di wextê xwe de daxwaza xwe bi riya serlêdanê bigihînin rêveberiya KuFZê.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

**KuFZ kengê girtî ne?**

Di dema **betlaneya dibistanan** de her KuFZek bi giştî di salê de 20 rojên xebatê girtî ye. 15 roj jê di dema betlaneya havînê de tên bikaranîn. KuFZ di pêşî de bi Meclîsa Şêwirmend a Dêûbavan re di derbarê diyarkirina van rojan de diaxive.
Her sal herî dereng di meha Adarê hûn ê agahî bigirin, ka KuFZ kengê girtî ne.
KuFZên nêzîkî hev bi hev re di derbarê demên betlaneyê diaxivin. Gava derfeteke din tune be, hingê zarokê/a we dikare hete hingê here KuFZeke din a nêzîk.
Di sala baxçeyê zarokan de çar roj **Rojên pêşxistina kalîteyê (Rojên QE)** ne. Di van rojan de xebatkar dikevin perwerdehiya pêşvebirinê û pêşxistina tîmê. Di Rojên-QE de xizmeta lênêrînê tê dayîn. Rêveberiya KuFZê tarîxên ji bo Rojên-QE diyar dike û bi Meclîsa Şêwirmend a Dêûbavan re diaxive.
Di **bûyerên taybet de** KuFZek dikare were girtin an jî tenê xizmeta sînorkirî ya lênêrîna zarokan bide. Gava derfeteke din tune be, tenê hingê ev yek tê kirin. Bo nimûne, ji ber rêzknameyeke Daîreya Tenduristiyê. Di bûyereke wisa de zarokê/a we nikare here KuFZeke din. Pereyê we jî dê li we newe vegerandin.
Dibe ku li KuFZê **gelek kêm xebatkar** hebin. Bo nimûne, gava gelek xebatkar di heman demî de nexweş bikevin an jî belkî têra xwe xebatkar tune bin an jî ji ber ku xebatkar di grevê de bin. Hingê dibe xizmeta lênêrîna zarokan dorsînorkirî be yan jî xizmeta awarte bê dayîn. Xizmeta awaret bo nimûne ev in:

- Tevahiya zarokan nikarin werin.
- Demên vekirî kêmtir in.
- Komek an jî çend kom dê werin girtin.

KuFZ dixwaze zarokan biparêze û xizmeteke baş a lênêrînê pêk bîne. Lewma bi qasî xebatkar dikarin li wan binêrin, ewqas zarok dikarin werin. Di *Qanûna Bremenê ya Navendên Danê Rojê û Lênêrîna Danê Rojê ya zarokan* de hatiye diyarkirin, ka pêdivî bi çend xebatkaran heye.
Rêveberiya KuFZê biryara di derbarê xizmeta awarte de distînin. Li gorî kêmbûna xebatkaran, derfetên cuda hene:

1. Çalakiyên pedagojîk betal dibin, bo nimûne gera li derve yan jî hayjêmana taybet a takezarokan.
2. Demên lênêrînê kêmtir dibin. Yan jî xizmeta zû yan jî xizmeta dereng nikare pêk were.
3. KuFZ komên zarokan digihîne hev an jî hinek koman digire.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

## Amadebûn, Betalkirina Qeydiyê û Kesên Li gel

**Gava zarokê/a we nikaribe were KuFZê, hingê divê hûn çi bikin?**
Divê zarokê/a we bi awayekî bi rêkûpêk were KuFZê, da ku KuFZ bikaribe piştgiriyeke baş bide zarokê/a we. Gava zarokê/a we nikaribe were, hingê divê yekser agahiyê bidin rêveberiya KuFZê yan jî rêveberiya komê. Bi qasî ku pêkan e, hûn sedemê jî bibêjin, bo nimûne: Zarokê/a we nexweş e.
**Demên fêrgeha zarokan ji bo zarokên dibistanê çawa ne?**
Ji bo zarokên dibistanê: KuFZ dikare demên fêrgeha zarokan ji bo zarokê/a we li gorî rojan bi we re diyar bike.
**Ciyê lênêrînê yê ji bo zarokê/a we dikare ji destê we biçe?**
Ji ber sedemeke girîng ciyê lênêrînê yê yê ji bo zarokê/a we dikare ji destê we biçe. Sedemeke girîng bo nimûne ev e: Hûn li gorî lihevkirinên girîng tevnagerin. Di bûyereke bi vî rengî de jî her car tiştê girîng ew e, ka tiştê baş ji bo zarok çi ye.
Gava zarokê/a we ji du hefteyan zêdetir nehatibe KuFZê û we agahî nedabe, hingê KuFZ dikare ciyê lênêrînê bide malbeteke din.
Beriya ya KuFZ vî ciyî bide malbeteke din, ew bi we re pêwendî datîne. Ji bo vê yekê KuFZ ji we re nameyeke bi îmze dişîne. Gava nameyek bi îmze were şandin, hingê hûn bi îmzeya xwe piştrast dikin, ku we nameyê wergirtiye. Gava sedemên we yên girîng hebin, ku hûn nikaribûn agahî bidin, hingê mafê ciyê we li we tê vegerandin.

**Hûn dikarin qeydiya zarokê/a xwe ya li KuFZê betal bikin?**
Hûn dikarin hete dawiya mehê qeydiya zarokê/a xwe betal bikin. Hingê divê hûn herî dereng 14 roj beriya dawiya mehê agahiyê bidin KuFZê. Gava hûn qeydiya zarokê/a xwe di meha paşî ya beriya betlaneya havînê de betal bikin, hingê divê hûn dîsa jî pereyên piştgir ên mayî bidin. Gava hûn ji ber malbarkirinê qeydiya zarokê/a xwe betal bikin, hingê hûn ne mecbûr in pereyên piştgir ên mayî bidin.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

**Kesekî/e din dikare zarokê/a we bîne yan jî bibe?**
Divê zarokê/a we di dema hatina bo KuFZê de û di dema vegera bo malê de di ewlehiyê de be. Bi KuFZê li hev bikim:

- Hûn zarokê/a xwe kengê tînin?
- Hûn zarokê/a xwe kengê dibin?
- Kîjan kesên din dikarin zarokê/a we bînin û bibin?
- Kîjan kes nikarin zarokê/a we bibin?
- Ji bo zarokên dibistanê: Destûr heye, zarokê/a we tenê vegere malê?

**Ji ger û seyranan çi girîng e?**
Ji KuFZê re îmzeya we lazim e, da ku zarokê/a we bikaribe bi wan re here ger û seyranan.

**Gava rewşa hewayê gelek zêde xirab be, hingê çi girîng e?**
Gava rewşa hewayê bi taybet gelek xirab be, hingê bila haya we ji hişyarî û agahiyên li ser Radio Bremenê hebe. Gava ba û qeşa hebe, hingê belkî zarokê/a we nikaribe were KuFZê.
*Hûn dikarin agahiyên berfirehtir ên li ser vê mijarê li ser pela agahiyê „Hişyariya di rewşên hewayê yên gelek xirab de“ bibînin, ku hûn dikarin ji KuFZê bistînin.*

## Hînbûn

**Hînbûna zarokan a li KuFZê çawa bi rê ve diçe?**
Divê zarok di serî de hînî derdora nû bibin. KuFZ dixwaze baş hay ji zarokên nû hebe. Lewma ne tevahiya zarokên di komekê de di heman demê de tên hînkirin. Zarok pey hev dest bi KuFZê dikin. Rêveberiya KuFZê dora wan diyar dike û bi dêûbavan re li ser diaxive.
Gava ji bo 1ê Tebaxê bersiva erêkirinê ji we re hatibe, hingê divê hûn pereyê piştgir ê dêûbavan ji 1ê Tebaxê û vir ve bidin. Gava zarokê/a bi paşê dest bi hînbûnê bike, dîsa jî divê bi awayekî asayî pere bidin.
Di dema hînbûnê de divê zarok xwe tenê hîs neke. Lewma kesek pê re tê, ku ew zarokî/ê baş nas dike, bo nimûne dayik an jî bav an jî kesekî/e pêbawer. Divê dêûbav bi xwe saz bikin, ka ew an jî kesekî/e pêbawer bi zarokê/a wan re tê.
Di dema hînbûnê de xebatkar bi we re gelek diaxivin û bi we re biryarên wisa distînin, ku ji bo zarokê/a we yên herî baş in.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

## Dêûbav hevpar dixebitin

**Dêûbav û KuFZ çawa dikarin bi hev re baş bixebitin?**
Bingeha xebata me, xebata bi dêûbavan re ye.
Bi awayekî bi rêkûpêk şevên dêûbavan tên lidarxistin. Salê herî kêm carekê KuFZ civîna yekbiyek ji bo we saz dike û agahî dide we, ka zarokê we bi çi awayî pêş dikeve.
Dêûbav meclîseke şêwirmend a dêûbavan hildibijêrin. Rêveberiya KuFZê bi meclîsa şêwirmend a dêûbavan re dixebite. Ew di vê xebata hevpar de li gorî *Rêzikên xebata hevpar a bi dezgehên dêûbavan re* ya Bremenê tevdigere.

## Pêşlênêrîna Tenduristiyê

**Kîjan agahiyên di derbarê tenduristiya zarokê/a we de ji KuFZê re lazim in?**
Divê tevahiya zarokên li KuFZan tendurist bimînin. KuFZ li ser vê mijarê bi Xizmeta Tenduristiyê ya Zarok û Ciwanan re dişêwire. Ev xizmet girêdayî Daîreya Tenduristiyê ya Bremenê ye.
Agahiyên girîng ên di derbarê tenduristiya zarokê/a xwe de ji bo rêveberiya KuFZê binivîsin:

- Zarokê/a we nexweş e yan jî problemeke wî/wê ya tenduristiyê heye?
- Bandora nexweşiyê yan jî ya problemê li ser lênêrînê heye?
- Alerjiyên zarokê/a we hene?
- Ji ber hinek xwarinan laşê wî/wê aciz dibe?

KuFZ agahiyan li ber çavan digire û li gorî wan rêbazan diyar dike.
**Divê zarokê/a we dermanan bixwe. Ev yek di dema lênêrînê de çawa çêdibe?**
Belkî ji zarokê/a we re bi awayekî bi rêkûpêk derman lazim bin, bo nimûne, ji ber ku nexweşiya wî/wê ya kronîk heye. Xebatkar ne mecbûr in dermanan bidin zarokan. Ew dikarin vê yekê red bikin.
Gava xebatkar ji bo vê yekê amade bin, hingê divê her tişt bi berfirehî were axaftin. Ji bo vê yekê ji KuFZê re îmzeya we divê. Wekî din divê hûn belgeyekê ji doktorê/a xwe radest bikin. Ji bo vê yekê vê formê bi kar bînin: *UK-FHB-dermandayîna li navendên lênêrîna zarokan a danê rojên*. Divê di vê formê de ev werin nivîsîn:

- Navê dermanî çi ye?
- Divê zarokê/a we ji vî dermanî çiqas bixwe?
- Divê zarokê/a we kengê û çawa vî dermanî bixwe?

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

- Ev derman divê çawa were hildan?
- Kîjan bandorên kêlekî yên vî dermanî dikarin rû bidin?
- Di bûyera awarte de KuFZ dikare çi bike?
- Gava pirs çêbûn, hingê KuFZ çawa dikare xwe bigihîne doktorê/a we (nav û hejmara telefonê)?

**Nexweşiyeke derbasdar a zarokê/a we heye. Divê hûn çi bikin?**

Zarokê/we nikare bi nexweşiyeke derbasdar were KuFZê. Hete zarokê we nexweşî belav bike, ev yek li kar e. Beriya zarokê/a we bikaribe dîsa were navendê, belkî rêveberiya KuFZê belgeyeke ji doktor an jî ji Daîreya Tendursitiyê bixwaze.

*Hûn dikarin agahiyên berfirehtir li ser pela agahiyê „Agahiyên li ser parastina bi vaksînê û parastina ji enfeksiyonan a li navendên lênêrîna zarokan a danê rojê“* bibînin.

**KuFZ çawa bi tenduristiya zarokê/a we mijûl dibe?**

Gava zarokê/a we nexweş xuya bike, hingê KuFZ yekser agahî dide we. Hingê divê hûn yekser werin zarok bibin.

Gava KuFZ nikaribe xwe bigihîne we, hingê destûra rêveberiya KuFZê heye, ku zarokê/a we bibe doktorekî/ê. Gava pêkan be, ew ê zaorkê/a we bibin doktorê we yê zarokan / doktora we ya zarokan.

Di dema qezayekê de an jî di dema bûyerên din ên awarte de destûra rêveberiya KuFZê heye, ku zarokê/a we bibin doktorekî/ê, ku wî/wê mûeyene bike.

**Zarokê/a we dikare kîjan xwarinan bi xwe re bîne KuFZê?**

Belkî hûn dixwazin xwarina malê bidin zarokê/a xwe û wî/wê bişînin navendê. Di vê rewşê de divê hûn li gorî rêbazên paqijiyê tevbigerin.

Hûn an jî zarokê/a we nikare van xwarinan bi xwe re KuFZê:

- goştê xav (bo nimûne Mett, moştê hêrkirî an jî Tartar)
- sicûqê xav (bo nimûne sicûqê bi pîvaz, Teewurst an jî Braunschweiger)
- şîrê xav an jî şîrê teze û berhemên ji şîrê xav (bo nimûne penêrê ji şîrê xav)
- goştê baş nehatiye pahtin (bo nimûne kofte)
- Masiyê xav an jî bidûkirî (bo nimûne somonê bidûkirî, somonê bi biharat an jî sushi)
- Xwarinên bi hêkê xav (bo nimûne mayoneza şîrîn an jî ya malê)
- Berfeşîrê heliyayî oder berfeşîrê, ku paşê dîsa qeşagirtî
- Salateya tûtikan
- Berhemên ji hevîr ên dagirtî, ku nehatine pahtin (bo nimûne keka bi krema)

*Hûn dikarin gahiyên berfirehtir û şîretan li ser Agahdariya Dêûbavan a BIPSê (Enstîtuya Leibnizê ya ji bo Lêkolîna Pêşîlêgirtinê û Epîdemiolojiyê) bibînin. Hûn agahiya dêûbavan ji KuFZê werdigirin.*

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

## Vaksîn

**Divê hûn di derbarê parastina vaksînê ya li dijî nexweşiya sorikê de çi bizanibin?**
Pêdiviya tevahiya zarokan bi vaksîna li dijî nexweşiya sorikê heye. Beriya ku zarokê/a we were KuFZê, divê hûn belgeya vaksînê pêşkêş bikin. Ev yek di *Qanûna Parastina ji Nexweşiya Sorikê ya li gorî § 20 Qanûna Parastina ji Enfeksiyê de* diyarkirî ye. Deftera vaksînê yan jî belgeyeke din a ji doktorekî yan jî ji doktorekê nîşanî rêveberiya KuFZê bikin.
Divê her kesê/a, ku ji 3 rojan zêdetir û rojê herî çend deqe li KuFZê be, divê wî/wê kesî/ê vaksîna li dijî nexweşiya sorikê li xwe dabe. Ev yek her wisa ji dêûbav, kesên di dema hînbûnê de pê re ne, xebatkarên kardestê jî derbas dibe. Lewma divê hûn parastina bi vaksînê ya li dijî nexweşiya sorikê piştrast bikin.
Ev kes ne mecbûr in vaksîna xwe piştrast bikin:

- Kesên, ku nikarin vaksîn li xwe bidin.
- Kesên, ku laşê wan li dijî nexweşiya sorikê parastî ye (bo nimûne, ji ber ku ew berê bi nexweşiya sorikê ketine û jê baş bûne).

Divê ev kes belgeyeke ji doktorekî yan jî ji doktorekê nîşan bidin.
Gava belegeya we ya piştrastkirina vaksînê ya ji bo nexweşiya sorikê tune be, hingê hûn û zarokê/a we nikarin werin KuFZê. Divê rêveberiya KuFZû hingê Daîreya Tendursitiyê di derbarê we û zarokê/a we de agahdar bike. Ji bo yekê divê rêveberiya KuFZê agahiyên we bide Daîreya Tenduristiyê, bo nimûne nav, adres û hejmara telefonê.

**Divê hûn di derbarê şêwirmendiya vaksînê de çi bizanibin?**
Divê hûn belgeyeke piştrastkirinê bidin KuFZê, ku hûn bi zarokê xwe re di derbarê vaksînê de bi doktorekî/ê re şêwirîne. Wekî din zarokê/a we nikare were KuFZê. Wekî belgeya piştrastkirinê ev yek tên qebûlkirin :

- Deftera zer a mûayeneya zarokan an jî
- deftera vaksînê ya zarokê/a we yan jî
- belgeyeke ji doktorekî ango ji doktorekê, ku piştrast dike hûn çûne şêwirmendiyeke di derbarê vaksînê de

Gava hûn nikaribin belgeyekê nîşan bidin, hingê divê rêveberiya KuFZê Daîreya Tendursitiyê di derbarê we de agahdar bike. Ji bo yekê divê rêveberiya KuFZê agahiyan bide Daîreya Tenduristiyê, bo nimûne nav, adres, rojbûn û hejmara telefona zarokê/a we. Ev yek di qanûnnameyan de diyarkirî ye.

Gava hûn nikaribin belgeya piştrastkirinê herî dereng hete çar hefte piştî hatina pêşî nîşan bidin, hingê KuFZ agahî dide Daîreya Tenduristiyê.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

## Sîgorte

**Sîgorteya zarokê/a we ya qezayê heye?**
Di dema lênêrînê de sîgorteya zarokê/a we ya qezayê heye. Ev yek sîgorteyeke qezayê ya qanûnî ye. Di *Qanûnnameya Sosyal VII* de rêbazên ji bo sîgorteya qezayê ya qanûnî nivîsî ne.

**Sîgorteya zarokê/a we di dema qezayan de kengê heye?**

- li ser riya rasterast a ji malê ber bi KuFZê ve.
- li ser riya rasterast a ji KuFZê ber bi malê ve.
- di dema lênêrîna di demên vekirî de.
- di dema tevahiya çalakiyên li KuFZê, li hewşa KuFZê yan jî di dema gerên li derve de.

**Gava zarokê/a we li ser riya ber bi KuFZê ve yan jî ber bi malê ve qezayekê derbas bike, hingê divê hûn çi bikin?**
Hingê yekser agahî bidin KuFZê. Rêveberiya KuFZê hingê dê qezayê ragihîne sîgorteya qezayê.

**Sîgorteya cil û tiştên din heye?**
KuFZ heqê tu tiştî nade:

- gava zarokê/a we cilê xwe an jî tiştekî din winda bike.
- gava zarokê/a we cil an jî tiştên xwe yên bi yên zarokên din re li hev şaş bike.
- gava cil an jî tiştên din xirab bibin.

## Pereyê Piştgir ê Dêûbavan

**Pereyê Piştgir ê Dêûbavan çi ye?**
Di *Qanûna Bremenê ya ji bo Piştgiriya Zarokan a li Navendên Danê Rojê û Lênêrîna Danê Rojê § 19 bend 1* de hatiye nivîsîn: Gava zarokê/a we here KuFYê, hingê Dêûbav pereyê piştgir ê dêûbavan didin. Pereyê piştgir ê dêûbavan heqê salane ye û bi riya 12 teqsîdan tê dayîn. Ev tê wê wateyê: Hûn her meh pereyê piştgir ê dêûbavan didin. Hûn pereyê piştgir ê dêûbavan ê yekemîn di meha Tebaxê de didin. Hûn pereyê piştgir ê dêûbavan ê dawî di Tîrmeha sala pêş de didin. Gava zarokê/a we ji lênêrîna di betlaneyê sûdê negire jî, divê hûn pereyê piştgir ê dêûbavan bidin.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

**Hûn pereyê piştgir ê dêûbavan didin kê?**

Performa Nord pereyê piştgir ê dêûbavan hesab dike û hûn rasterast vî pereyî didin Performa Nordê. Performa Nordê ev peywir ji Welatê Bremenê girtiye.

**Pereyê piştgir ê dêûbavan çiqas e?**

Pereyê piştgir ê dêûbavan dikare ji bo her dêûbavan cuda be. Ev qanûn diyar dikin, ka pereyê piştgir çiqas e:

- *§ 19 bend 1 hete 4 ê § 20 yên Qanûna Bremenê ya ji bo Piştgiriya Zarokan a li Navendên Danê Rojê û Lênêrîna Danê Rojê* û
- *§ 1 bend 3 ya Rêziknameya Pereyê Piştgir a ji bo Baxçeyê Zarokan*

## Parastina Agahiyan

**KiTa Bremen çi dike ji agahiyên we?**

KuFZ agahiyên we û yên zarokê/a we tomar dike. KuFZ agahiyan tenê li gorî destûra qanûnan tomar dike.

KuFZ hinek agahiyan tomar dike, ji ber ku ew agahî ji bo lênêrîna zarokê/a we girîng in. KuFZ hinek agahiyan tomar dike, ji ber ku ev yek peywireke qanênî ye. Ji bo hinek agahiyan KuFZ ji we pirs dike, ka destûra wan heye, ku ew tomar bikin.

*Hûn dikarin di derbarê parastina agahiyan de agahiyên berfirehtir li vê derê bibînin www.kita.bremen.de/datenschutz.*

**Destûr heye, ku li KuFZê wêne û fîlm werin girtin an jî deng werin qeydkirin?**

Tenê bi destûra we dikarin wêne û fîlmên zarokê/a we werin girtin an jî dengê wî/wê were qeydkirin an jî belavkirin..

Gava dêûbav lbixwazin i KuFZê wêne û fîlmê zarokên din bigirin an jî dengê wan qeyd bikin, hingê divê ew di pêşî de destûrê bigirin.

## Çalakiyên din ên li KuFZê

**Kesên din jî dikarin KuFZê bi kar bînin?**

KuFZ ciyên ji bo zarok û malbatan in. Lewma kesên din ên li taxê jî dikarin KuFZê û hewşa wê bi kar bînin. Her wisa saziyên din jî dikarin KuFZê bi kar bînin. Bo nimûne.

- Saziyên piştgirî didin zarok, ciwan û malbatan die Kinder.
- Saziyên piştgiriyê didin çandê.
- Saziyên piştgiriyê didin sporê.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û Malbatan ên Bajarê Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

KiTa Bremen rêbaz û mesrefan diyar dike. Tenê hevpeymanên bikaranînê û hevpeymanên kirêkirinê hene.
Mitbexa sereke û tevahiya tiştên tê de nikarin werin bikaranîn. KuFZ hay jê dimîne, ku xizmeta lênêrînê bi awayekî normal pêk were. Divê karê xebatkaran ji ber bikaranîna zêde, zêde nebe.

## Likarbûn

Ev rêbazên ji niha û pê ve li kar in.

KiTa Bremen
Navendên Zarok û
Malbatan ên Bajarê
Bremenê

Adresa Postê
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de